

Celîlê Celîl

Şeş pirtûkên kurdî yên nenas

(Ragihandineke kêrhatî ji „Pirtûkxana Casimê Celîl”)

Vê axiryê „Pirtûkxana Casimê Celîl“ hijmarên pirtûkên xwe, bi komeke pirtûkên kurdî yên salên 30-î li Yêrêvanê bi tîpên latînî çap bibûn, zêde kir. Ewana bi giranî pirtûkên bona dibistanên kurdîne, ji koma yekê heta koma hefta, ser matêmatîkayê; fîzîkayê; dinyazanebûnê; dîrokê; elîfba; zimanzanya kurdî; pirtûkên xwandina zimanê kurdî (kurmançî). Pirhijmarin usa jî berevokên nivîsarvan û hilbestvana, werger – mînakên ji edebyeta klasîkên ermenya, rusa û yêvropya. Bireke pirtûka yê sîyasîne: ser nivîsar û axaftinên serokên partya komûnîstyê û dewletêne; ser tendirûstyê, nexwaşyane; ser avakirina gund û kolxozadane û yê mayîn.

Van pirtûkxana Casimê Celîl, hên li salên 30-î, bi xemxurî û dildarî, heryekî ji wana bi 2-3 mînaka, bi destê xwe kaxazada pêçaye, bi tîlên bihêz girêdaye, ser her pêçekekê nivîsîye: „Bona nebî, nebîçirkên min“ û hildaye parastye, heta gîhandye rojên me.

Ser pirtûkên kurdî, yê li salên buhurî li Sovêtê û bi taybetî li Ermenistanê çap bibûn, sê bîblyografya hene. Yek „Bîblîografya kitêbêd kurdyêve sovêtyê“-e (Yêrêvan 1962), ya ku N.A. Alêksanyan amade kirye. Herdê dinê jî ji alyê Celîlê Celîl hatine amadekirin, yek „Pirtûka kurdî li Ermenistanê. 1930-1980“.(Yêrêvan 1981); ya dinê „Kurd li Ermenistana Sovêtê 1920-1980“. Bîblîografya. (Yêrêvan 1987)

Xudanê bîblîografya pêşin, hêja N.A. Alêksanyane, salên dirêj li pirtûkxana nateweyîye Lênîngradê (naka Pêtêrsbûrg), li para edebyeta bi zimanên gel û komarên Sovêtê, kar kirye.

Min vî camêrî li salên 60-î, salên xwandina mine ser têza doktora li Lênîngradê nas kiribû. Mam Nêrsês, ew merîkî gelekî nefsbîçûk, dilgerm karhiz bû. Li salên sî tevî bingehdanîn û pêşvabirina çanda kurdî bûye. Me bi hevra timê yan bi ermenî, yan bi kurdî xeverdida. Kurdya wî ji welêt salên zarotyê dihat. Nek tenê rind edebyeta kurdîye salên 30-î zanibû, lê usa jî xûdana xwe rêtya ser rîya gulvedana wê. Bi amadekirina (tertîbîkirina) wî li sala 1930 pirtûka “Vladîmîr Îlyîç Úlyanov – Lênîn li zîndanê û sirgûnêda” çap bûye. Li bîblyografyaê, ku wî amadekirye, ev pirtûk ber hijmara Nr. 3-ye.

Bawarîya min hebû, ku evan hersê bîblîografyana, gotî hemû pirtûkên kurdî, ku li Yêrêvanê çap bibûn dane xuyakirin. Bawarîya min bingeha xwe ser çî digirt? Li Sovêtê qanûnek hebû, hemû pirtûk, kovar, rojname, çik li seranserî Sovêtê çap dibûn, divêt berî pêş 40-50 mînaka, gorî lista ber destê çapxana, bişandana wanara. Nava vê lîstê dayîreyên dewletêye anegor bûn, paşê du pirtûkxanê Sovêtêye mezin, yek: Li Moskwayê Pirtûkxana ser navê V.Î.Lênîn bû, giringtirîn pirtûkxana Sovêtê; ya dua: Pirtûkxana neteweyî ser navê Saltîkov-Şçêdrîn bû li Lênîngradê. Bîblîografya Alêksanyan hema ser bingeha vê koma pirtûkên, ku anegorî lîstê dişandin Lênîngradê, hatibû avakirin. Nava bîblîografya Alêksanyanda pirtûkên dersê yê li Azerbêcanê – Bekuyê, li salên 30-î hatibûn çapkirin, ewana jî cî girtine.


Pey cîguhastina arxîv û pirtûkxana Casimê Celîl ji Yêrêvanê li Vênayê û cîwar kirina wana li pirtûkxanê, di rêza sedan pirtûkêda şeş pirtûkên kurdîye nû, atlaseke kurdî jî hatine dîtin, ku li van hersê bîblîografyaên li jor navkirî, nehatibûn îşaret kirin.

Navê van şeş pirtûkan ez raberî rewşenbîrên kurda dikim, bi wê armancê, ku kesên li ser dîroka edebiyet û rewşenbîrya kurdî lêkolîna dikin û bi taybetî ser edebiyeta kurdên sovêtê û dixwazin her tişt ser vê dîrokê kamil bizanbîn, haya wana ji van pirtûka hebe.




Tarîqa Înglaba Oktyabrê. Tertîb kir Ereb Şamîlov. Neşra dewleta Şêwra Ermenistanê. Rewan 1931, 71 rû. Format: 12,5 x 18 cm.

Têbînî: ser rûyê pirtûkêye pêşin sal 1930 nivîsîye. Muqedeme (Gilyê pêş) ser du rûya Ereb Şamîlov nivîsîye.



Zanebûna dinyayê. Kitêba xebatê bona mektebê dereca koma sisya û çara. Tertîb kir Nûrî. Bi rêdaktorya Hev. Casimê Celîl û N.X. Neşira hukumatê. Rewan 1933. 155 rû. Format: 15 x 22,5 cm.



Stalîn Î. Derheqa xevata gundda (xeberdan plênûma tevayî Merkezoma Firqa K (b) Hemtivaqê û Kontrol Komîsya Merkezî 1933 s. 11 meha kanûnê. Neşra Firqê – sêksya kitêbê kurmanca. Rewan 1934. Tercme kir R. Drambyan. Red cavdar Casimê Celîl. 26 rû. Format 13 x 17,8 cm.



Şamîlov Erebat. Kurmançed Elegezê. Rêdaktorê cavdar Casimê Celîl. Neşra Hukmeta Ermenistanê. Rewan 1936. 64 rû. Format: 12,8 x 17 cm.



H.Cindî. Kitêba zîmanê kurmançî. Bona dersxana sisya. Neşra hukumeta CŞS Ermenyê. Yêrêvan 1937. Rêdektor Casimê Celîl û Edoyê Cengo. 106 rû. Format: 14,4 x 20,5.



Emînê Evdal. Kitêba zîmanê kurmançî. Bona dersxana pêncâ. Neşira Hukumata CŞS Ermenyê. Yêrêvan 1937. Rêdaktorî kirin S.Kîrakosyan, Casimê Celîl. 222 rû. Format 15 x 21,4 cm.